ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:52 PM Page 24

## Berhemên Şêx Nûreddînê Birîfkanî

Şêx Memdû'hê Birîfkanî di dawîya dîwana Şêx Nûreddînê Birîfkanî da û di rûpelek serbixwe berhemên Şêx Nûreddînî têda nivîsîye û bivî awayî gûtîye:

Berhemên seydayê min Şêx Nûreddînê Birîfkanî yê ku li sal 1205 hicrî li gundê Birîfkan hatîye ser dunyayê û li sal 1268 hicrî çûye ber dilovanîya Xwedê û hatîye veşartin li gundê Birîfkan. Şêx Nûreddîn kurê seyid Ebdulcebarî kurê seyid Nûreddînê Birîfkanî yê 'Huseynî ye. Piştra berhemên Şêx Nûreddînî bi vî awayî rêz kirine û li hember wan hinek çavkanî li ser danîne:

1. **"El-bidûr el-celîye fî ma messet îleyhî 'hacat el-fûqerai el-'sûfîye"**. Di navbera sal 1230 - 1238h nivîsandîye. Ji bû dîyarkirina rêçên 'sûfîtîyê yên durust. (Destnivîsa ku bi destxetên Şêx Nûreddînî bi xwe li mala seyid Nûrmu'hemmed kurê Şêx 'Ubeydulahîye li Dihûkê heye.)

2. **"Meramûl-îslam".** Şêx Nûreddînî di roja 9ê 'erefe (Zûl 'Hîcce) sal 1248 hicrî temam kirîye. (Şer'ha helbesta Şêx Muhemmed Xebbazê Mûsilî dike, kû ji 45 beyta bi kar hatiye, Şêx Muhemmedê Xebbaz di sala 1240 h. nivîsandîye). Destnivîsa ku bi destxetê Şêx Nûreddînî bi xwe ye li cem Şêx Memdû'hê kurê seyid Mu'hsinê Birîfkanî ye li Dihûkê.

3. **"Menaqib el-'xews el-e'i'zem"** hatîye wergerandin ji zimanê farisî. Şêx Nûreddînî di sala 1253 hicrî wergêrandîye û temam kirîye, destnivîsa ku bi destxetê Şêx Nûreddînî bi xwe

li cem Memdû'hê Birîfkanî ye li Dihûkê.

4. **"Tu'hfetul mûrîd îla el-qurb wel tew'hîd"** {bi zimanê farisî ye}. Şêx Nûreddînî di sala 1259 temam kirîye, destnivîsa ku bi destxetê Şêx Nûreddînî bi xwe li cem Memdû'hê kurê Mu'hsînê Birîfkanî ye.

5. **"Mîfta'h el-mû'eşerat":** şer'ha helbestên xwe yên (el-Mû'eşerat) dike. Bi destxetên Şêx Nûreddînî bi xwe li cem seyid Memdû'hê kurê Mu'hsinê Birîfkanî ye.

6. **"El-fet'h el-er'hem lî şer'h el-'hizbûl e'i'zem".** Destnivîsek jê li cem Mecîd Efendî Şewqî li Mûsilê heye, belê destnivîsa bi destxetê Şêx Nûreddînî bi xwe nexuya ye.

7. **"Tenbîh el-nîyam"** destnivîsek jê li cem Mela Qasimî ye, xizmetkarê tekîya Birîfkan.

8. **"Dîwan-el î'icaz "erebî û farisî û kurdî"** bi zimanê 'erebî û farisî û kurdî ye, gelek destnivîs jê li cem Memdû'hê Birîfkanî ne.

9. **"Îbraz deqaîq el-'heqaîq"** Şer'ha helbesta wî ya ('haîye), ya bi navê **"El-'Heqaîq"** di sala 1234 h. temam kirîye û bi vê beytê destpê dike. **"Kesefet 'hîceb fewqel cene'h**
**'en se'idîl 'ebdî 'alîl nece'h".**

10. **"El-behce":** du beş in, bi destxetên Şêx Nûreddînî bi xwe ne, beşê dûyê li cem Memdû'hê kurê Mu'hsinê Birîfkanî ye. Mehemmed Nûrî, ku yek ji xelîfên wî ye, di sala 1286 h. şeri'h kirîye di pirtûka bi navê **"Behcet el-salikîn 'ela qe'sîdet el-Şeyx Nûreddîn"** da.

11. **"Ne'zimul fennîye"** du beş in, bi destxetên Şêx Nûreddînî bi xwe ne, beşê dûyê li cem Memdû'hê kurê Mu'hsinê Birîfkanî ye. Me'hfû'z Muhemmed 'Umer beg el-'Ebbasî dibêje ev pirtûk navê wê **"Na'zim 'xinnîyet el-Şeyx 'Ebdûlqadir el-Geylanî (r)"** ye, Şêx Nûreddînî şer'ha wê kirîye li ser gûtina El-'Hebbar di pirtûka **"Men'h el- Menan"** şer'ha helbesta (taîye) ye.

12. **"Adab el-Xelwe"** (be'i'z mîn el-resaîl el-mûteferrîqe). Hinek ji nameyên ji yêk cudane, li cem Memdû'hê Birîfkanî ne. Tê da be'hsa rêyên rêça Qadirî, ku çawa li ser biçin, dike, Şêx Muhemmed 'Ebdûl'hemîdê Etrûşî di pirtûka xwe ya bi navê

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:52 PM Page 26

**"Nehcet el-selak"** be'hs kirîye.

13. **"El-cewher el-meknûn"**: ev destnivîs ya nedîyar û berze ye. (Şerha helbesta bi navê {Qurretûl 'eyn fî el-sulûk} kirîye). Şêx Necmeddîn Muhemmed Tahir 'Saî'x Zade be'hsa wê kirîye.

14. **"Zuxretûl salikîn"** (ne'zemehû bîllû'xe'tîl kurdî), dîwana wî ye ya ku bi zimanê kurdî nivîsîye, jimarên rêzên helbestan (409) rêz in, Şêx Nûreddînî li gundê Îtûtê li sala 1236 hicrî temam kirîye û destnivîsek jê li cem Memdû'hê kurê Mu'hsinê Birîfkanî ye. Di nav vê dîwanê da me çap kirîye.

*Berhemên Şêx Nûreddînî zortirin. Ji van yên ku Şêx Memdû'hê Birîfkanî bi destxeta xwe di rûpelekê da nivîsandibûn, belkî ew rûpel temam dibû û berdewamîya wê di rûpelek din da temam kirîne.*

Lê hindî ku em dizanîn, berhemên Şêx Nûreddînî heta roja îro zêdetir in, yên mayî evin:

15. **"El-fet'h el-er'hem".** Şer'ha helbesta (El-Xebbaz kirîye). Ev pirtûk bi dû destxeta ye.

16. **"Telxî's el-'hîkem".** Pirtûkek mezin e, jimarên rêzên beyta 2200 in. Di nav da şer'ha (El-'Hîkem el-'e'taîye) kirîye.

17. **"Resaîlûhû îla xûlefaîhî we murîdîh".** Pirtûkek mezin e, bi her sê zimanan - kurdî, 'erebî û farisî ye. Name û îcazên wî yên olî û zanistî ne û namên kû ji mirîdên xwe ra şandine.

18. **"Dîwan ş'irîhî bîllû'xetîl 'erebîye".** Dîwanek mezin e, xelîfê wî seyid Mehemmed Nûrî yê Mûsilî di sala 1280 h. kûm kirîne.

19. **"Bu'xyet el-sûfîye".** Şer'ha helbesta wî ya (dallîye) bi vê beytê destpê dike. **"Seeltûke bîîsmîllah ya wa'hîdel e'hedî weyamen yûcîbûl mûstecîbû îza qe'sed".**

20. **"'Hucet el-lehce".** Ji ber pirtûka **"Behcet el-esrar we me'idenûl enwar fî menaqib el-Şeyx 'Ebdûlqadir el-Geylanî"** ye. Şêx Nûreddînî di sala 1239 h. li gundê Îtûtê nivîsandîye.

21. **"Qe'sîdet qurret el-'eyn".**

22. **"Men'zûme"** bi vê beytê destpê dike.

***"Kesefet 'hîceb fewqel cene'h 'en se'idîl 'ebdî 'alîl nece'h"***

Zanayekî bi vî navî **"Mîriat el-'heqaîq 'heq el-'teraîq fî beyan 'uwey'sat el-'heqaîq"** şer'hek li ser kirîye.

23. **"El-qe'sîde el-nûnî ye".**

24. **"El-qe'sîde el-hemzî ye"**, kû pêşîya wê bi vê rêza helbestê destpê dike: ***"Febîzalîkel sîrr el-mûnewerr lîlwerai yenhîllû sêrrûll 'heq fîl eşîyai".***

25. **"Rîsale fî 'hukum el dûxxan".** Seyid 'Hesenê 'Hebbar gûtîye kû Şêx Nûreddînî bi giştî şer'h kirîye.

26. Şer'ha Şêx Nûreddînê Birîfkanî li ser helbesta Şêx Es'edê Mûsilî kirîye, li ser xelîfên Raşidî ye.

27. Dîwana farisî.

28. Dîwana kurdî.

29. Şer'ha Şêx Nûreddînê Birîfkanî li ser helbestên bapîrê xwe yê çarê Şêx Şemseddînê Qutbê Exlatî yê Birîfkanî bi zimanê 'erebî di navbera sal 1230 - 1238 h. kirîye, xudanê dîwana 'ecêb bi zimanê kurdî.

30. "**Mînhac el-Salikîn fî el-Te'sewwif".** Di nav destxeta bi navê **"El dîwan"** da ye, di sala 1264 h. nivîsandîye û helbesta wî ya (dallîye) ji ber hatîye bergirtin, bi vê beytê destpê dike.

***Mûrîdî mûrîdûl 'heqqî fîl qurbî wel bû'idî***
***Weqa'sîdûhû fîl 'hukmî ma anefeke 'en qe'sdî***

31. Şer'ha helbesta xweya (baiîye) ya kû bi navê **"Kûrbîl 'hal mîn zîl cemalî wel celal"** kirîye. Di sala 1231 h. nivîsandîye bi vê rêzê destpê dike:

***Bîmecla 'sîfatûl zatî qed yefle'hûl qelbû***
***Feana bîhî 'terebûn we 'hîna bîhî kerbû***

32. Şer'ha helbesta wî ya (baîye) {Fî 'ilmil tew'hîd} de. Weha destpê dike:

***Ya 'heyatel fûadî bîlwa'slî 'heyya***
***Înnefîl 'heyyî mu'xremen bîke 'heyya.***

33. Şer'ha helbesta wî ya (lammîyel elfîye) seyid 'Hesenê 'Hebbar di pirtûka xwe ya bi navê **"El mewahib el îlahîye"** şerih kirîye, tê da navên mezinên 'terîqa (rêça) Qadirî ne.

---

*Ji bû pitir naskirin û berhem û jîyana Şêx Nûreddînê Birîkanî pirtûka bi navê "El Îmam Muhemmed el Rì`zwanî" û "Îmaret Behdînan el `Ebasîye" yên kû Mehfû`zê `Ebbasî nivîs*andîn bixwîne)

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:52 PM Page 28

## Jîyannameya
## Şêx Şemseddînê (El-Qu'tub) yê Exlatî yê Birîfkanî
## (997 - 1085 hicrî) (1588 - 1674 zayînî)

Şêx Şemseddînê Exlatî yê Birîfkanî bapîrê çarê yê Şêx Nûreddînê Birîfkanî ye. Şêx Şemseddînê Exlatî yê Birîfkanî di sala 997 hicrî - 1588 zayînî li bajêrê Exlat yê ser bi Bidlîsê li Kurdistana Bakûr ji binemalek rewşenbîr û navdar hatiye ser dunyayê, bi kûka xwe digehe Şêx 'Huseynê Exlatî yê navdar. Xwendina destpêk di dibistanên Exlatê da dersên olî û zanist xwendîye û îcaza olî li wir wergirtîye û bûye serkêşê zemanê xwe.

Seyid Ebdulkerîmê Exlatî di gel herdu kurên xwe Şemseddînê Exlatî û Mehemmed Emîn yê ku bi navê (Qu'tbeddîn) dihête nîyasîn, Exlat bi cih hiştin, berev eşîra Dûskî Jûrî li bakûrê Ûremarêve çûn û li wir cihwar bûn.

Ev mişextbûna Şêx Ebdilkerîmî ji ber wan şeran hat, yên ku di nêvbera herdu dewletên 'Sefewî û Osmanî domdarbûn, ku sed salan vekêşand û piranîya wan kinarên bakûrên be'hra Wanê û devera Exlatê kiribûn meydana şerên xwe. Êdî şêx li nêv eşîra Dûskî Jorîya da cihwar bûn, ya ku li jêr sêbera hakimê Hekarî sultan 'Îmadeddînê Hekarî yê ku hakim bû li Hekarî heya sal 1049 hicrî - 1639 zayînî, ji ber ku ew dever pir asê bû, ji ber wan hemû çiyayên mezin Şêx Ebdilkerîm li wir ma, heta ku wefat kirî di gel kurê xwe yê bi nav Mehemmed Emîn,

yê ku bi navê (Qutbeddîn) dihête nîyasîn û bav û kalê seyîdên Sen'anîyan e (Xwedê ji wan razî bît). Paşan kurê Seyid Ebdilkerîmî Şêx Şemseddînê Exlatî digel birazayê xwe Sen'an - kurê Mehemmed Emînî, di gel koçerbûneka eşîra Ertûşîya (ev eşîre eşîreke koçer bû û carna koçerbûna wan li serdemê dewleta Osmanî digihêşte devera mizûrîyan li Başûrê Kurdistanê) êdî li sala 1030 hicrî, ku dike 1620 zayînî, Şêx Şemseddînê Exlatî û birazayê xwe bi wan ra bûn û di gel wan gihêştine Amêdîyê li devera Behdînan, ku dikefte ser rêya koçerbûna wan da. Eşîra Ertûşî li Amêdîyê rawesta ji bû silavkirinê li hakimê wê û him jî destûrxwestinê ji hakimê wê, ku mafê geryanê li devera li bin desthilata wî bide wan. Hingê hakimê Amêdîyê (Sîdî xan) bû. Dema Sîdî xanî Şêx Şemseddînî Exlatî dîtî û bi zanîn û oldarîya wî zanî, jê xwest ku li devera Behdînan bimîne û têda rêça xwe ya sofîtî belav bike. Sîdî xanî heft gund dîyarî Şêx Şemseddînê Exlatî kirin (**Birîfkan, Gelî Riman, Bazîdkê, Bêgeh, Rikava, Aluka û Tildêbê**). Şêx Şemseddînî daxaza hakimê Amêdîyê erê kir û li gundê Birîfkan tekîya xwe damezirand û dest bi belavkirina rêça xwe ya olî kir ya ku (Xelwatî - Sehrwerdî) bû û li wir berdewam bû li ser karê Êrşadê, heta ku çûye ber dilovanîya Xwedê sal 1674 zayînî li gundê Birîfkan û gorê wî heta niha bûye mezargehê xelqê.

Şêx Şemseddînê Exlatî pênc kurên wî hebûn:

Yê yekê seyid Mûsa (1023 - 1111 hicrî) bû, ew jî babkalê seyidên gelê riman û Dergel û Bêskê û hin deverên dî ye. Şêx Şemseddînî karê rêvebirina mulkan û xizmeta mêhvanan û karûbarê navmalê dabûne desta.

Kurê duyê yê Şêx Şemseddînê Exlatî - seyid 'Ebdilre'hman e (1025 - 1103 hicrî). Ew jî babkalê seyidên Etrûşê û Dêre û Navkurê û hin deverên dî ye. Şêx Şemseddînî karê Êrşad û we'izê dabû desta.

Kurê sîyê yê Şêx Şemseddînê Exlatî - seyid 'Ebdul'xenî (1027 - 1121 hicrî) ew jî babkalê seyidên Beroşkê û beşek ji seyidên Nesre ye. Karê xwendin û fêrkirin û xwendkar û zanîn û rewşenbîrîyê birêve dibir.

Kurê çarê yê Şêx Şemseddînê Exlatî - seyid Zeynûl'abiddîn

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:52 PM Page 30

e (1035 - 1119 hicrî) ew jî babkalê binemala el-Nûrî û Şêstnavdîn û binemala ’Xezalî ye, di serdema xwe da qazî bû, karê pêywendî û berevanî pêkînan û çarekirina girift û xwîndarîyan bi rêve dibir.

Kurê pêncê yê Şêx Şemseddînê Exlatî - seyid Mu’hyeddîn e (1039 - 1120 hicrî) ew jî babkalê seyidên binemala mela û seyidên ’A’sî û beşek ji Nisirê û beşek ji seyidên Birîfkan û Sernê ye. Karê pêşnivêjîyê li mizgefta Birîfka dikir.

Şêx Şemseddînê Exlatî yê Birîfkanî yekem kes bû, ku tekîya Birîfka ava kirî û dest bi belavkirina rêça olî kirî, ya ku di destpêkê da (Xelwetî) bû. Lê li serdema nevîyê wî - Şêx Nûreddînê Birîfkanî rêça (Qadirî) biserve hate zêdekirin. Belavkirina rêça Xelwatî ya Şêx Şemseddînî û xizmeta zarokên wî dikir, nêzîkî dused salan berdewam kir. Heta ku Şêx Nûreddînê Birîfkanî dîyar û xuya bû û ji hevdemên xwe pêştir bû û bûye şêxekî mezin. Êdî karê Êrşadê bi dest xweva girt û bû serokê binemala Birîfkan û hemû pişt bo wî vegeran û naznavê (El-Nûrî) bûye navê hemûyan ji vê binemalê û bûye navê xudanên terîqa Qadirîya Birîfkanî jî.

Şêx Şemseddînê Exlatî zaneyek û sofîyekî navdar bû û ji kenkenêt serdema xwe bû û helbestvanekê jêhatî bû, wî helbest bi her sê zimanan - zimanê zikmakî yê kurdî, ’erebî û farisî, bi zimanekê rehwan û xweş dîwanên helbestan vehandibûn û piranîya wan li ser sûfîtîyê û şîretvanîyê bûn, ji bilî vê hindê jî gelek ji berhem û pirtûkan nivîsandîne digel dîwana helbestan bi zimanê ’erebî, kû dîwanek pir mezin e. Heya îro jî nehatîne çapkirin. Şêx Şemseddînê Exlatî yê Birîfkanî navdar bûye li her çar parçên Kurdistanê di sala 1085 hicrî - 1674 zayînî li Birîfkan çûye ber dilovanîya Xwedê û gorê wî yê pîrûz heya roja îro tê seredankirin.

## Seyid Şêx Huseynê Exlatî (*)
## (808 hicrî - 1405 zayînî koç kirî)

*Bapîrê yanzdê yê Şêx Nûreddînê Birîfkanî ye*
*(Ji bû bêtir naskirina binyata binemala Birîfkanîyan, me pêwîstî dît ku vê danasînê ji bû xwendevanan dîyar bikin û çap bikin)*

**Şêx Huseynê Exlatî** kurê seyid **Ebûl 'Hesen Elî** kurê seyid **Hac Nîzameddîn** kurê seyid **Ehmed** kurê seyid **Zeynûl'abiddîn 'Elî yê Zurdanî yê Muwa'hidê Xorasanî ye.**

Mîr Şerefxanê Bîtlîsî di pirtûka xweya "Şeref-nameyê" di beşa "Exlat" da dibêjît:

Gelek sazîyên xêrxwaz ji mizgeft û dibistan û qutabxane û dîwan û cih li Exlatê hene. Ew jî cihê ji dayîkbûna zana û maqûl û şêx û ewliyan e.

Ji wana seyid 'Huseynê Exlatîye, yê şehreza di 'ilmên ('Zahir û Ba'tin) da dipêşîya hemû zaneyên serdemê xweda bû. Dîsan êkanê zemanê xwe bû di warê zanîna 'ilmê (El-Cefer), lûma jî bi vê zanebûna xwe zanî ku leşkerê Cengîzxanî bi talanên mezin li Îranê û Turkistanê - Tûranê radibin û berî ku ew talan û fîtne bigehin devera Exlat, wî dunzdeh hizar malbatên mirûv û dûst û mirîdên xwe di sala 790 hicrî ji Exlatê barkirin berev welatê Misirêve çûn û li wir man heya ku ew çûye ber dilovanîya Xwedê (sal 808 h. - 1405 z.) û gorê wîyê pîrûz liwire û heta îro jî taxek li Misirê heye bi navê "Taxê Exlatîya" li ser navê wan e.

Seyid **Me'irûfê Exlatî** kurê seyid **E'hmed** di perawêza kû nivîsay li ser pirtûka bi navê ("Sîrr el-Esmai wel 'Hirûf) ji danana Şêx **'Huseynê Exlatî** kurê seyid **Ebûl 'Hesen 'Elî** kurê **'Hac Nî'zameddîn** weha gotîye:

Seydayê min 'Huseynê Exlatî di pirtûka xweya ku bi navê ("Zexaîr el-Esma") gotîye min (Cûbe) û îcaza giştî di hemû 'hizban û navan û pîtan ji bav û şêxê xwe seyid **'Elî yê Exlatî** wergirtîye. Wî jî îcaze ji bav û şêxê xwe **'Hac Nî'zameddînî** wergirtîye, wî jî îcaze ji bav û şêxê xwe seyid **E'hmedê Exlatî**

kû ew mezin û bapîrê seyidên Exlatê û Birîfkanê ye, û yekemîn kes bû ji Hemedanê hatîye Exlatê di serdema sultan (**Tikûdar {E'hmed}** kurê **Hûlakû**) da, sal 682 hicrî wî jî îcaze ji bav û şêxê xwe - mîrê mezin **Şêx Zeynul'abiddîn 'Elî** yê **Zurdanî** yê **Muwa'hidê Xorasanî** wergirtîye. Senedeka din **Şêx 'Huseynê Exlatî** dibêjît min îcaze ji bav û seyidê xwe seyid (**Ebûl 'Hesen 'Elî** kurê se**yid Nî'zameddînî**) wergirtîye, wî jî îcaze ji şêx **Zeynûddîn yê Xanî** wergirtîye, wî jî ji şêxê mezin Welîyê kamil **Şêx Muhemmedê Çehl yê Tinanî yê Qerexilanî** (Qeddese 'ellahû sîrrehû) wergirtîye, wî jî ji şêx û seyid û mîrê mezin **Zeynûl'abiddîn 'Elî yê Muwe'hidê Xorasanî** yê navdar bi **Zûrdanî** wergirtîye, ku sal 685 hicrî li Bûzincê çûye ber dilovanîya Xwedê. (Bozincê gundeke ji gundên Hemedanê û dibên Bozincirdê). Wî jî 'ilm û îcaza xwe ji şêxê xwe îmam **Nûreddîn 'Ebdûlre'hman Kesrevî yê Esferaînî** yê Misrî yê kû li sal 639 hicrî ji dayîk bûye û li 705 hicrî li Bexdadê kûç kirî wergirtîye, wî jî ji şêxê xwe îmam **Cemaleddîn E'hmed Cûzvanî** yê ku sal 669 hicrî wefat kirî, wî jî ji şêxê xwe îmam (**Re'zaddîn 'Elî yê Lalai**), yê ku li (3 meha rebî'i el-Ewwel sal 642ê hicrî) kûç kirî. Wî jî ji şêxê xwe îmam **Necmeddîn Kubra** yê ku sal 618 hicrî çûye ber dilovanîya Xwedê, îcaze wergirtîye, wî jî ji şêxê xwe îmam **Zûzûbahanê Biflî** yê Misrî yê ku li navarasta meha mu'herrem, sal 606 hicrî kûç kirî wergirtîye, wî jî ji şêxê xwe îmam '**Ebdûlqehar** (**yê Sehrewerd**), yê ku navdar e bi ('**Zîyaeddîn,** yê kû li sal 563 hicrî kûç kirî wergirtîye, wî jî ji şêxê xwe îmam **Qazî Wecîheddîn** yê navdar bi ('**Emmewîye**) wergirtîye, wî jî ji bav û şêxê xwe îmam **Muhemmedî** wergirtîye, wî jî ji şêxê xwe **E'hmed** kurê **Eswedê Deyneweri** wergirtîye, wî jî ji şêxê xwe îmam **'Hemşadê Deyneweri** wergirtîye, wî jî ji şêxê xwe îmam **Şêx Cuneydê Be'xdadî** wergirtîye, wî jî ji şêxê xwe (**'Zîyaeddîn Sirrî el-Seqi's**) Xwedê jê razî bît, wergirtîye, wî jî îcaze ji şêxê xwe îmam **Şêx Me'irûfê Kerxî** Xwedê jê razî wergirtîye, wî jî ji Şêxê xwe îmam **Dawûd el-'Taî**, Xwedê jê razî wergirtîye, wî jî ji şêxê xwe **'Hebîbê 'Ecemî** Xwedê jê razî, wergirtîye, wî jî ji îmamê mezin **Şêx 'Hesenê Be'srî** Xwedê jê razî, wergirtîye, wî jî ji (Emîr el-Muiminîn), mîrê musulmana **'Elî bin Ebî 'Talib** wer-

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:52 PM Page 33

girtîye, wî jî ji (seyid el-Murselîn) **Muhemmed el-Muxtar** ’Se’llae’llahû ’Elayhî Wesellem (’Er’hîmna bîhîm ya Er’heme el-Ra’himîn).

Min ji bav-kalên xwe bihîst, ku bapîrê me yê mezin (seyid Kemal el-Mûlle Weldîn) seyid ’Huseynê Exlatî kurê seyid Ebûl ’Hesen ’Elî kurê ’Hac Nî’zameddînî, dema ku ji Exlata Romê berev welatê Misrêve çûyî, di sala 790ê hicrî gelek ji mirov û mirîd û dostên wî, ku nêzîkî deh hezar mala bûn, ji Exlat û dewr û berêwê digel çûn welatê Misrê û cihwar bûn û li wêderê tekîyayek bi navê Şêx ’Huseynê Exlatî, Xwedê jê razî bît, digel taxek bi navê Exlatîyan ava kirin.

Di gel wan mirûvên hîcret kirîn, pismamê min bû, **seyid Mecdî** kurê **seyid ’Ebdulkerîmî** kurê **seyid E’hmedî** kurê **seyid Zeynûl’abidîn ’Elî yê Zurdanî** kurê **seyid ’Sali’hê Hemedanî** kurê **seyid Yûsifê Hemedanî** kurê **seyid Selîm Ebû Mûslimê ’Îraqî yê Hemedanî** kurê **Yûsifê Hemedanî** (eba Ye’iqûb yê ku sal 535ê hicrî kûç kirî), kurê **seyid Eyûb** kurê **seyid ’Sedreddîn Mehemmed Yûsif** kurê **seyid Celaleddîn ’Huseyn** kurê **seyid Zeynûl’abiddîn** (Ebû el-Mûeyyed ’Elî Şu’eyb yê navdar bi Zuhre û dibên Bohre) kurê **seyid Ce’ifer (Ebûl-’Heres)** kurê seyid **Muhemmed Re’zewî** kurê **seyid Me’hmûd Re’zewî** kurê **seyid E’hmed Re’zewî** kurê **seyid ’Ebdûllayê Re’zewî** kurê **seyid ’Elîyê (el-Mûntexeb el-Muxtar Weneqîb Eşraf Be’xdad)** kurê **îmam Ce’iferî** kurê **îmam ’Elîyê Hadî** kurê **îmam Muhemmed el-Cewadî** kurê **îmam ’Elî yê Ri’za** kurê îmam **Mûsa el-Ka’zim** kurê **îmam Ce’ifer el-’Sadiq** kurê **îmam Muhemmed el-Baqir** kurê (**îmam Zeynûl’abiddîn ’Elî el-Sûccad**) kurê îmam ’**Huseyn** kurê ’**Elî bin Ebî ’Talib.** Xwedê ji wan razîbit.

Herwiha pismamekê minê din jî di gel Şêx ’Huseynê Exlatî, kû hîcret kirî, ew jî seyid Mûslim kurê Osman kurê seyid Mihemmedî kurê seyid ’Ebdûlre’hmanî kurê seyid ’Sali’hî kurê seyid Yûsifî kurê seyid Selîm (Ebû Mûslim) kurê seyid (Eba Ye’iqûb Yûsif) kurê Eyûbê Bozincî yê Hemedanî yê Xorasanî ye. Dema ku seyid Huseynê Exlatî çûye ber dilovanîya Xwedê sal 808ê hicrî, ku dike 1405 zayînî, li Misirê hat veşartin û gorekê dîyar û mezin li wir heye û dihête zîyaretkirin heta îrû.

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:52 PM Page 34

Êdî bû karê îrşadê, Şêx Bedreddîn Muhemmed kurê Îsraîl kurê 'Ebdûl'ezîz kurê (el-Qa'zî Semawîye el-Rûmî) piştî we'xerkirina Şêx 'Huseynê Exlatî bi şeş meha cihê Şêx 'Huseynê Exlatî girt ji bû Îrşadê, lê paşan Şêx Bedreddînî Misir bi cih hişt û vegerîya welatê Romîya - Exlat. Seyid Babaman'sûr kurê seyid 'Huseynê Exlatî yê Navhatî li cihê wî rûnişt ji bû karê îrşadkirinê. Piştra sal 810 hicrî seyid Baba Men'sûr vegeriya Exlatê di gel mala xwe, ji bû karê îrşadê li wêderê û êdî ne vegera Misrê ve.

Û hêşta gelek ji mirovên me li Misrêne, ku li wê derê di akincîne û niha piranîya me seyidên Exlatê li taxa (Dûrre) ku taxeke li Exlatê binecihin, ku ew cihê bav û bab-kalên meye. Xwedê ji wan hemûyan û ji me razî bît.

**Seyid Me'irûf** kurê **seyid E'hmedê Exlatî** (yê kû sal 935 hicrî kûç kirî) kurê **seyid Îbrahîm** (yê kû sal 900 hicrî kûç kirî) kurê **seyid 'Elî** (yê kû sal 870 hicrî kûç kirî) kurê **seyid Baba Meq'sûd** (yê kû sal 840 hicrî kûç kirî) kurê **seyid 'Huseynê Exlatî** Xwedê ji wan razî bit, li mizgefta (Elwadî) û bi rex gorê bapîrê me yê mezin seyid **'Hac Nî'zameddîn** kurê (seyid Lûrbaba **seyid E'hmedê Exlatî** yê **Hemedanî yê Bozincî yê Xorasanî**). Seyid Me'irûfî weha nivîsîye: "Li roja duşembî 25ê meha receb sal 961 hicrî di wê sala kû şah ('**Tihmasib**) hatîye ser welatê Kurdistanê û Azirbaycanê û piştî vegera me ji hîcretê bi pênc salan".

Seyid (E'hmedê Exaltî kurê Zeynûl'abiddîn 'Elîyê Zûrdanî yê Mûwe'hidê Xorasanî yê Bûzincî) ew e, yê ku ji Hemedanê çûye bajêrê Exlat li serdema sultan (Tikûdar {E'hmed}) kurê Holakûxan kurê Tûlxan kurê Cengîzxanî an ku sal 682 hicrî piştî ku babê wî seyid Zeynûl'abidîn kurê 'Elîyê navdar bi (Mûwe'hidê Xorasanî yê navdar bi Zûrdanî) danaye ser xîlafeta terîqa Sehrwerdî. (E'llahumme Îr'hemna westûrna we'hfe'zna bîlû'tfîke wekeremîke mîn fîtnet el-zeman, amîn ya seyidel mûrselîn).

**Şêx Memdû'hê Birîfkanî**

*1940 - 1966ê zayînî nivîsandîye.* (Şêx Memdû'hê Birîfkanî li cihekê gûtîye ev nivîsîne di meha mu'herrem sala 1389 hicrî de min nivîsandîye).

Li ser gûtina Şêx Memdû'hê Birîfkanî kû bavê "Şêx 'Huseynê Exlatî" (kû navê wî Ebû el-'Hesen 'Elî el-Xelawetî ye), vî Ebû el-'Hesen 'Elî du kur hebûn. Yê yekê Şêx 'Huseynê Exlatî yê nav hatî, sal 808 hicrî - 1405 zayînî kûç kirîye. Navê kurê Ebû el-'Hesen 'Elî yê din (Yûsif) bû. Yûsifî kurek hebû bi navê 'Huseyn (*Yûsifî ev nave li ser navê birayê xwe lê kiribû)* û ev 'Huseynê kurê Yûsifî, kurê Ebû el-'Hesen 'Elî di sala 795ê hicrî hatiye ser dunyayê, dike 1394ê zayînî. Zanayekê mezin bû di zanist û hunerê da, li Bidlîsê maye, piştra çûye gelek cihên din, ji wan ciha Cizîrê bû û piştra çûye (El Na'sîre), piştra çûye Şamê û dawî çûye (Mekke) û li wir maye 'heya çûye ber dilovanîya Xwedê di sala 858ê hicrî, kû dike 1454ê zayînî. Xwedê jê razî bît.

Û ev ('Huseynê kurê Yûsifî kurê Ebû el-'Hesen 'Elî yê Xelewatî) ew e, yê kû *Mam Hejarî di "Şerefxana Bidlîsî" da ya kû vegerandîye zarava soranî, be'hsa vî 'Huseynî kirîye, lê Mam Hejarî gûtîye belkî (Şêx 'Huseynê Exlatî kurê Ebû el-'Hesen 'Elî) ew Şêx 'Huseyn e, yê kû di rewşenbîrîyê û zanistê da gelek navdar bûye, lê li (Mekke) kûç kirîye, lê belê navê babê wî Yûsif kurê Ebû el-'Hesen 'Elî bûye.*

Ew 'Huseynê kurê Yûsifî kurê Ebû el-'Hesen 'Elî, yê kû Mam Hejarî be'hs kirî, **kurê birayê Şêx 'Huseynê Exlatî ye.**

(*) Şêx Memdû'hê Birîfkanî ev nivîsîna li ser Şêx 'Huseynê Exlatî û bav-kalên wî bi zimanê 'erebî li dawîya dîwana Şêx Şemseddînê Qutbê Exlatî yê Birîfkanî nivîsandibû, me vegerand ser zimanê kurdî û ev renca Şêx Memdû'h pê rabûyî ji bû ronkirin û parêstina binyata vê binemalê, herwiha ji bû parêstina dîroka kurdan.

**Zahid Birîfkanî**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:52 PM Page 36

# Zibanê Kurdî

## Dîwana Şêx Nûreddînê Birîfkanî

## Helbest

*Bîsmîllah el-re'hman el re'hîm, we bîhî neste'în*

## 'Herf-el elîf (pîta A)

### Îlahêma

Ah ey wa'hidê hemtayek wî îlahêma
Bi kerem bête mecalê kerema te ahêma

Te dinasim bi dû we'sfên te, kû re'hman û re'hîm
Herdû we'sfan 'xeriqandin dixuda, gunahêma

Malîkelmulkî mucerred tuyî bê şibhû ne'zîr
Tuyî rebbî qîdemê 'hakim û padişahêma

Tuyî quddûsê ji nuq'san û 'iyûban berî
Tuyî sabbû'hê mu'tehher, digirî sîyahêma

Be yeqîn her tu selamî ji mera der dû cîhan
Tu bi 'îzzet bigehînî, bi selamê cahêma

{Bi emanet birisan 'tifil mera çûn tu kefîl}
Bi xû sîrabê dikî, çakirê xaneqahêma

Tuyî mûimin tu mûheymin tuyî cebbar û 'ezîz
Mutekebir tuyî xaliq tuyî hem penahêma

Tuyî te'swîrê dikî nû'tfeî ez şiklê nîko
Tu nîkokarê mebê tac deh û kulahêma

Mahê nû dermehê 'imrê me ber 'xema du reqîb
Bigehîn 'halê kemalî bişû'a'ê mahêma

Bi beraet, bi kelaet, bi 'hîraset nêgerî
Bi 'inayet, bi hîdayet bikirî nigahêma

Me ji xew rake li 'husnê bike mûştaq û nedîm
Da kû hemrazî tebim der şebê întîbahêma

Bade 'hîna kû me nûşî 'heyfe bêmey bibitin(**1**)
Tu nedî min, tu nedî bê dil û dilxahêma

Tu bi îşraqê cemalê, me mûnewerke ji nûr
Da kû îşraq bidit şe'işe'eyê cîbahêma

Berzexa cami'ê esma bi te Nûrî wekûdî
Be'hrê 'Emmanê 'emîqim, di silûk û rahêma.

---

***Berî: pak, munezeh, berîi, bê sûc.***
***Sîrab: têraw, têrav.***
***Nîko: ciwan, niko.***
***Nîkokar: ew kes e yê kû karê çak dike.***
***Kûlah: kulaw, kulav.***
***Nêgerî: birwanî, çawlêbikey.***
***Bikirî: durstkey, ancamî bidey.***
***Nigah: nîgah: riwanîn.***
***Dilxah: dilxwaz, pesend.***

Di nava vê helbestê da Şêx Nûreddînî bawerîyek mezin bi nûrê û îşraqê heye. (Peyrewî mektebî Îşraqî ke dahênerî Şehabeddîn Suhreberdî feylesofî kurd e.)

## Gehî însim gehî cînnim

Gehî însim gehî cînnim, gehî ’aqil gehî şeyda
Gehî der xelwexanim, geh li dêrim gah derbeyda

Gehî mewcûd û geh m’edûm û gahî berzexa kewnim(**1**)
Gehî bazim li be’t’haê gehî xergûşî derqeyda

Bi rojê zeybeqa firar û derşeb rû’hê iksîrim
Di ecsadê wicûdî rû’hê pakim zehre pê ’heyda

Di canê ’aşiqan şewqim, gehî nûrim di bînayan
Gehî teswîlê nefsanim, gehî ’eqlim di gel şeyda

Le’tîfim gah wekî bayê, kesîfim geh wekî axê(**2**)
Gehî ez cewherê xemrim di meyxanê kû min meyda

Tecella der dilê ’arif ji berqa qerqefê minda
Fiyû’za salikê badê me jê herdem peyapêda

Bi xû mewcim ji deryayê kû bayê l’merkebê dayê
Bi edna ’tûrfetûl’eynî dûsed menzil mewê ’teyda

Zi her ewtar û nayan min gihandin mesme’ê nûrî
Sema’û ne’xmeya tedhî dema çeng û def û neyda

***Xelwexan: xelwetxane.***
***Xergûş: kivrîşk, kêvrûşk, kirwêşk.***
***Iksîr: Şêx, pêşewa, mirûvî tewaw, cewherek kû mahîyeta cisma (leşa) diguhêrît, mîna cîwe dikete zîv. Mis dike altûn yan zêr.***
***Teswîl: rê şaşkirin, rêga lê win kirin, tûşî gumrahî kirdin.***
***Cewherê xemir: xiltey şerab, tîratîya ku di binî da dimîne.***
***Kesîf: mûkessef, çirr, six.***
***Mewê teyd: têmanperand, têperandin, ser ra borîn.***
***Zi her: ji her, li her.***
***Tedihî: te dibihîst.***

(**1**)Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda li cihê peyva "û geh m'edûm" nivîsandibû "gehî m'edûm" û li hember "û geh" nivîsandibû "bedel", ku tê mena ev cihê "gehî" digre.

(**2**)Şêx Memdû'hê Birîfkanî di destxeta xweda li cihê peyva "kesîfim geh" li ser peyva "geh" nivîsandibû "ne", belkî mebesta wî ku "kesîfim ne wekî axê".

Ev helbeste îşaret e bû yekbûnî bûn û bûnewer (We`hdet el wicûd wel mewcûd)

**Dengê ’seda**

B’me ’eceb hatine guh deng û ’seda
Ji defû nayû neyû çeng û ’seda

Şahidê cebrû celala mine ew
Beneseq tênû bi yek deng û ’seda

Çi belav hatinû vajî kemû kûz
Te digû mu’xbeçînê peng û ’seda

Qelibandin me ’heqaiq ji dinê
Min nedî ’xeyrî kej û jengê ’seda

Pinbeder gûş binêh da nebihî
Gazîyê dike ji xir tengê ’seda

Her ’sedayek ji derê qûbbee tên
Wekî dewrê bi fersengê ’seda

Destdana nede ser qeb’zeê dil
Mûrşidane kû nema jengê ’seda

Me kû dî li nik pê ’sa’hibe rah
Bi cibarî kû diçin cengê ’seda

Me ji dergahê derya te bihîst
Ne’xmeyê ’hûr û perî şengê ’seda

Veke vê ’sef’heyê pir ’hîkmet û surr
Dê bihî bê ’eded ez nengê ’seda

Me berê qulfeyê dilber me vekir
Dilê ’tarî kû nema cengû ’seda

Heme ’alem bi xû dîtim çû fe’za
Firehin belke hemî ’tengû ’seda

Be kivanê ne’zîrî min kû ji dil
Bi xû rimbazîne ez neyêk ’seda

Cewherê ’alemê min se’h kû dikir
Ji te ’alem min didî ne b’yek ’seda

’Hûtê Yûnisî li ser heykelilkewn
Bitera hevrî û hevdengê ’seda

Mûn’ekis cûmle, qe’zîyey me kû dî
Kû li mi’iyarê sivik ’seng û ’seda

’Heq bi nûrê wekû da wechet û ro
Dilê Nûrî bûye arengê ’seda.

---

***Mu’xbeçe: (mu’x: pêşeway ayînî Zerdeşt), ew kurê li meyxanê mey digêre.***
***Kej: xwar, xar.***
***Binêh: bixe, dayîne.***
***Neng: şûreyî, ’eyb û ’ar.***

**Tecellet lî ’sîfatû’llah** (*)

Tecellet lî ’sîfatû’llahî fî esna me’anîha
Fela’het lî bîhal ekwanû qa’sîha wedanîha

Me’hellûl fey’zî qelbî welmesanî keşfûha ’iîndî
Wetîlkel ayetûl kûbrra lena seb’û mesanîha

Nîbahûn bîleyadî ’heqeqûhûl nûsxetûl ’sû’xra
Bena fî e’hsenîl teqwîmî mîn te’swîrî banîha

Şiûnûl ’heqî ta’srîfûn we t’erîfûn we teilîfûn
We teidîbûn we teqrîbûn welen neitî bîşanîha

Zi m’ena heykelê însan û be’hsa vî hîyûlaî
Xebîrim er te pisyare ji ûstadî me’anîha

Hûnakel kewnû la yezdadû ’en şey’în we’en ’zîllîn
Xûzîl mewcûde fîl eşyaî wehcûr be’ide sanîha

Hûwel xellaqû welfe’allû lîlînsanî mînxeyrîn
We mîn şerrîn femînhûl kûllû ’hanîha wexanîha

Bî’eynîn teb’sûrûl eşyaû xalîn lew te’heqeqna
’Hemedna kûlle zî fê’ilîn wela zemme lîcanîha

Hewayek er ji dev derbê mûcelaket dilê nûrî
Hewayê nef’hê mestane çû mil’h enderanîha

---

***Heyûlai: nefsa nepak, nefsî napak.***
***Enderanîha: şiverê, rê biçkûle.***
***Mil`h: xoy, xoyê, xuwê***

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:52 PM Page 44

## ’Temefa

’Temefa qelbê gula lame û nêrgiz ’temefa
Me’tefa ’eksê dila lame û qurmiz ’temefa

Me’tefa şîn û elîf hemze û batayî welî
Kû li ser Şam û ’Iîraqê heye dinkiz ’temefa

’Temefa qu’tbê cîhan û melik û ’hakim û şah
Û sivik hatine bû we’sletê şebdiz ’temefa

Me’tefa ’enber û miskê di dinêda ji tebû
Di meşamê û di enûfê heme kundir ’temefa

’Temefa ’sebirê me nayê kû ji hicrê dimirîn
Çû ’hekîman qe nedî maye li serkiz ’temefa

Me’tefa ’zerb û cefaya te jibû min bigehit
Digirîn ’eynî qebûlê wekû ma’iz ’temefa

’Temefa lal kirim ger çi wekî bilbil bûm(**1**)
Wê dema faşî tebû laleê mû’iciz ’temefa

Me’tefa tilxî û ’teb’iê meê şîrîn te kirî
Her ji hingê kû me dî şêweyê teymiz ’temefa

’Temefa Rûm û Ecem ’hamilê ’alayê te bin
Li serê şah û ’xulamane merakiz ’temefa

Me’tefa sîneyê da’xate kewandî şeb û rûz
Ji fîraqê wekû birîyane bi kizkiz ’temefa